Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi

DÜSBED

*Sayı / Issue: 36(2024), Sayfalar / Pages: 285-307*

Araştırma Makalesi / Research Article
**DOI: 10.15182.diclesosbed.1450821**
Received / Başvuru: 11.03.2024
Accepted / Kabul: 02.06.2024

# POETÎKAYA HELBESTA NEQŞEBENDÎTÎYÊ DI MÎNAKA DÎWANA SEYDAYÊ LICEYÎ DA

SEYDAYÊ LICEYÎ DÎVANI ÖRNEĞİNDE NAKŞİBENDİ ŞİİRİ POETİKASI

POETICS OF NAQSHBANDI POETRY IN THE EXAMPLE OF SEYDAYÊ LICEYÎ DIVAN

Zülküf ERGÜN*

**Kurte**

Neqşebendîtîya Xalidî di serê sedsala 19ê da li ser destê Mewlana Xalidî di nav civaka kurdî da belav dibe û di demeke kurt da dibe dîyardeyeke civakî. Ev bizav hevterîbî rêxistina xwe ya civakî di qada edebî da jî dibe sedema derketina xwendingeheke helbestî ya nû. Ev xwendingeh herçend ji gelek alîyan ve xwe bispêre helbesta sofîgerîyê jî xwedî hin taybetmendîyên xweser e. Em di vê gotarê da di mînaka dîwana Seydayê Liceyî da hewl didin taybetmendîyên poetîkaya helbesta vê bizavê destnîşan bikin. Ji bo vê em helbestên wî di çarçoveya temayên evîn, pesindana Şêx, Pêxember û Xwedayî, wesifdana destûrên Neqşebendîtîyê yên mîna suhbet, rabite, zikir û muraqebeyê û şêwaza bangeşeya terîqetê da destnîşan dikin û digihîjin wê encamê ku poetîkaya helbesta Neqşebendîtîyê ji alîyê cîhanbînî û armancên xwe ve ji peotîkaya modern cîyawaztir e. Ji ber vê tevî ku dibe sedema derketina çendîn helbestvanên nû û berbelavbûna zimanê kurdî jî em poetîkaya vê bizavê berevajî geşedanên serdemî dibînin û bi vê riwangehê şirove dikin.

**Bêjeyên Sereke:** Poetîka, helbest, Neqşebendîtî, Seydayê Liceyî.

**Öz**

Halidi Nakşibendiliği 19. yüzyılın başlarında Mevlana Halid öncülüğünde Kürt toplumu içinde yaygınlaşan ve kısa bir süre içinde toplumsal bir olgu haline gelen sosyal bir yapıdır. Bu akım toplumsal örgütlenmesine paralel olarak edebi alanda da yeni bir şiir ekolünün oraya çıkmasına sebep olur. Bu ekol birçok açıdan tasavuf şiirine dayansa da özgün bir yapıya sahiptir. Bu makalede Seydayê Liceyî divanı örneğinde bu akımın poetik özelliklerini belirlemeye çalışıyoruz. Bu amaçla Liceyî'nin şiirlerini aşk, Şeyh, Peygamber ve Allah övgüsü; sohbet, rabıta, zikir, murakabe gibi Nakşibendiliğin düsturlarının tasviri ve bu tarikatın tebliği gibi konular çerçevesinde ele alıyoruz ve dünya görüşü ve amaçları itibariyle Nakşibendi şiir poetikasının, çağının modern poetikasından farklı olduğu sonucuna ulaşıyoruz. Bu yönüyle Nakşibendi şiir poetikası birçok yeni şairin ortaya çıkmasına ve Kürt dilinin yaygınlaşmasını neden olsa da dönemin gelişmelerinin karşıtı bir gelişme olarak değerlendiriyoruz.

**Anahtar Kelimeler:** Poetika, şiir, Nakşibendilik, Seydayê Liceyî.

**Abstract**

Khalidi Naqshbandism is a social structure that became widespread in Kurdish society under the leadership of Mevlana Khalid in the early 19th century and became a social phenomenon in a short period of time. Parallel to its social organization, this movement also gave rise to a new school of poetry in the literary field. Although this school is based on tasawuf poetry in many respects, it has a unique structure. In this article, we try to identify the poetic characteristics of this movement in the example of Seydayê Liceyî divan. For this purpose, we analyze Liceyî's poetry within the framework of topics such as love, praise of the Shaykh, the Prophet, and Allah; the description of the tenets of Naqshbandism such as

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, E-posta: zxweshevi@gmail.com, ORCID: 0000-0001-8784-5636.

conversation, rabta, dhikr, and murakabah, and the preaching of this order; and we come to the conclusion that Naqshbandi poetics in terms of its worldview and aims is different from the modern scientific poetics of its time. In this respect, even though the Naqshbandi poetics led to the emergence of many new poets and the spread of the Kurdish language, we see it as a development contrary to the developments of the time.

**Keywords:** Poetics, poetry, Naqshbandism, Seydayê Liceyî.

## DESTPÊK

Helbesta kurdî ya serdema îslamî heta sedsala 19ê li ser heman poetîkaya helbestî tê berhemanîn ku rengvedana şaristanîya îslamî ye. Di sedsala 19ê da wek xeleka dawî ya vê şaristanîyê Mewlana Xalid di nav civaka kurdî da bizaveke xurt a sofîgerîyê dide destpêkirin û bi vê tevgera xwe ya kartêker dibe sedem ku li dor xaneqa û medreseyên Neqşebendîtîya Xalidî edebîyateke sofîgerîyê geş bibe. Bi vî awayî navborî hem dibe pêşengê bizaveke sofîgerîyê hem jî damezirînerê xwendingeheke edebî. Herçend dîwana wî di navendên edebî yên Xalidîtîyê da bê xwendin (Adak, 2017, r.62) û ji bo helbestvanên vê xwendingehê bibe çavkanîyeke poetîk jî ji bilî çend helbestên bi kurdî dîwana xwe bi farisî dinivîse. Loma jî bizava edebî ya Neqşebendîtîyê bi kurdî ne di dema wî da piştî wî di nîvê duyem ê sedsala 19ê û pê da geş dibe û dibe dîyardeyeke edebî.

Herçend di vê maweyê da li ser destê Hacî Qadirê Koyî bingeha poetîkayeke nû bê danîn jî (Ergün, 2022) nûnerên vê xwendingehê ji vê rewşa nû bê agah, bi paldana nerîta sofîgerîyê li ser pêşketinên manewî, îdealên axretê û evîneke muteal zûr dibin û ji alîyê îdeolojîk û gotarî ve dinyayê û hemû tiştên madî biçûk dixin û fezîletên terka dinyayê mezin dikin. Hevterîbê vê têgihîştinê ji alîyê sîyasî ve jî piştgirîya sîstema xelîfetîya îslamî dikin (Kavak, 2019, r.20-21) û bi vê helwestê li hember geşedanên neteweyî yên hevçerx û adaptasyona li rewşa modern bergirîyeke manewî çê dikin. Ji vî alîyî ve di navbera têgihîştina neqşebendîyan û poetîkaya Hacî Qadirê Koyî da ku li ser bingeha “zanîn, fen û netewetîyê” hatibû danîn, nakokî û cîyawazîyeke berbiçav heye.

Tevî vê rewşa nakok û arasteyên dijber, nûnerên bizava Neqşebendîtîyê li dor kesayetîya şêxên xwe û li ser bingeha xaneqa û medreseyên xwe edebîyateke dînî ya sofîgerîyê berhem tînin ku ji hin alîyan ve li ser nerîta edebîyata kurdî ya berî xwe ye û ji hin alîyan ve jî ji wan cîyawaztir e. Ji bo dîyarkirina poetîkaya vê bizavê em dê di mînaka Dîwana Seydayê Liceyî da taybetmendî û poetîkaya helbesta Neqşebendîtîya Xalidî gengeşe bikin û rengûrûyên wê destnîşan bikin. Ji bo derxistina wêneyê giştî yê vê helbestê em dê carinan amaje bi Dîwana Mewlana Xalidî û Dîwana Şêx Ebdulqadirê Hezanî jî bikin ku yê yekem damezirînerê Neqşebendîtîya Xalidî ye û yê duyem jî hem pêşengê neqşebendîyên devera Liceyê ye hem jî şêxê Seydayê Liceyî ye ku li ser destê wî dersa Neqşebendîtîyê werdigire û di bin karîgerîya helbestên wî da dest bi nivîsîna helbestan dike.

## 1. Dîrok Û Zemîna Civakî Ya Geşedana Neqşebendîtîyê Di Nav Kurdan Da

Li hember şecereyên malbatên desthilatdar ku reha xwe bi rêya xwînê bi navdarekî dêrîn yan çavkanîyeke dînî ya "rewa" ve girê didin (Bedlîsî, 2007) rêbazên sofîgerîyê sîlsîleyeke manewî çê dikin û her yek ji wan ji xwe ra bavekî destpêkê û peyrewên wî yên navdar destnîşan dikin ku ji şêxên navdar ên wê rêbazê pêk tên. Herçend di hin çavkanîyan da behsa sê baskên neqşebendîyan bê kirin jî Neqşebendîtîya Xalidî Hezretê Ebûbekirî wek bavê yekem ê vê bizavê qebûl dike û sîlsîleya Neqşebendîtîyê ji wî dide destpêkirin. Bi vî awayî bi hatina her mucedidek (nûker) ev rêbaz navekî nû werdigire û bi demê ra navên Siddîqîye, Teyfûrîye, Xaceganîye, Neqşebendîye, Ehrarîye, Mucedidîye, Mezherîyeyê û Xalidîyeyê werdigire (Eraydın, 1994, r.344-375).

Peywendîya kurdan di gel Neqşebendîtîyê zû dest pê dike. Ji nav xelîfeyên Ebeydulahê Ehrarî (1404-1490) em rastî Mewlana Seyîd Elîyê Kurdî tên ku bi eslê xwe ji Amedîyeyê ye (Algar, 2007, r.190) û ev nîşan dide ku qet nebe beşeke kurdan ji vê bizavê agahdar in. Hin çavkanî destpêka hatina vê terîqetê ji bo nav kurdan wek sedsala 16ê destnîşan dikin (Tenik, 2015, r.89) û Ewlîya Çelebî jî di sedsala 17ê da li şeş bajarên kurdan behsa hebûna Neqşebendîtîyê dike (Bruinessen, 2008, r.47). Lê di 1639ê da ji ber zêdebûna murîdên wî dema ku Sultan Muradê Çarem, Ezîz Mehmûd Urmewî li Dîyarbekirê bi dar ve dike (Weismann, 2015, r.206) karîgerîya Neqşebendîtîyê li ser civaka kurdî kêm dibe û piştî demekê jî vedimire. Lê di serê sedsala 19ê da bi pêşengîya Mewlana Xalidî (1779-1827) Neqşebendîtî careke din di nav kurdan da geş dibe û di demeke kurt da karîgerîyeke mezin li ser tevahîya civaka kurdî û welatê Osmanî çê dike. Ev karîgerî ne tenê li ser civakê, li ser vê bizavê bi xwe jî çê dibe, lewra Mewlana Xalid wek nûkerê dawî yê Neqşebendîtîyê rengê xwe dide vê rêbazê, Xalîdîtîyê dike şiroveyeke bihêz a Neqşebendîtîyê û rêçikeke taybetî dadimezirîne (Algar, 2007, r.42).

Mewlana Xalid bi dîyarkirina 116 yan 118 xelîfeyên xwe (Weismann, 2015, r.187; Yüksel, 1993, r.146) di demeke kurt da xeleka bangeşeya rêbaza xwe berfireh dike, her xelîfeyekî wî dibe navendeke cazîbeyê û bi vî awayî di nav civaka kurdî da tevgera wî dibe dîyardeyeke sosyolojîk. Bêguman di vê rewşê da karîgerîya sîyaseta navendîkirina Osmanî û jinavbirina mîrektîyên kurdan jî heye. Lewra dema ku dewlet nikare vê qadê bi tevahî kontrol bike, ev valahî ji alîyê neqşebendîyan ve tê dagirtin (Bruinessen, 2003) û ev jî zemîna civakî ya Neqşebendîtîyê bihêztir dike. Li alîyê din li hember Qadirîtîya ku di bin hejmûna çend malbatên seyîd da (Berzencî û Nehrî) wek monarşîyeke manewî ji bavî derbazî kurî dibû (Bruinessen, 2008, r.32) û formeke arîstokratîk werdigirtibû (Yüksel, 1993, r.64), Neqşîbendî bi riwangeheke nû, vê hîyerarşîyê dişikîne û bi tayînkirina gelek xelîfeyan nîşan dide ku her mirov

dikare bi rêya perwerdeyê bigihîje van pileyên bilind ên manewî. Ji ber vî alîyê xwe jî bizaveke nû dixe nav civakê û weha dike ku ji bilî beşdarîya mirovên asayî, gelek şêx û murîdên qadirî jî bibin Neqşebendî (Bruinessen, 2003, r.330). Bi vî awayî pêgeha civakî ya Qadirîtîyê lawaz dibe û Neqşebendîtî dibe tevgera zal di nav kurdan da.

Ji bilî vê derfeta libar a civakî û sîyasî, sedemeke din a belavbûna Neqşebendîtîyê jî ew e ku ev tevger li hember arîstokrasîya malbatî ya mîran û seyîdan, bi rêya perwerdeya xaneqa û medreseyê ku hertim pêkve bûn, rêçikeke hêsantir dide ber civakê û ev jî rê xweş dike ku wergirên vê perwerdeyê bi hêsanî bikarin di nav civakê da bigihîjin pileyên rêzgirtî. Ji ber vê di nav kurdan da li hember bajarên ku navenda mîran û qadirîyan bûn neqşebendî gundan ji xwe ra dikin navend. Ji vî alîyî ve vederkirina Mewlana Xalidî ji alîyê qadirî û mîrên Baban ve ji Silêmanîyê, rûdaneke giring û sembolîk e. Loma jî di bin navê "îrşad"ê da Mewlana Xalid xelîfeyên xwe dişîne her alîyê welatî û her xelîfeyekî neqşebendî biçe ku derê medrese û xaneqayekê vedike û dest bi perwerdeya zanistên dînî û terbîyeya manewî ya sofîgerîyê dike. Ji ber vê neqşebendî ji bilî vê rêbaza xwe ya karîger a rêxistinî, ji hêza zindî ya gundîyan jî sûd werdigirin û bi arîkarîya polîtîkayên Osmanî li hember arîstokrasîya bajarîyên kurd bihêz dibin.

## 2. Seydayê Liceyî Û Serborîya Wî Ya Helbestî

Seydayê Liceyî di 1853yê da li Liceyê ji dayik dibe. Navê wî yê rastî Mihemed Hadî ye. Herçend di helbestên xwe da naznavê "Hadî"yî bi kar bîne jî bi navê "Seydayê Liceyî" navdar dibe. Li gor ragihandina nevîyê wî Mihemed Cemîl Seydayî, bapîrê wî kurê Sibxetulah e û ew jî kurê mîrê dawî yê Rewandizê Ristem Paşayî ye. Li hember vê ragihandinê, Doskî dîyar dike ku di çavkanîyan da bi navê Sibxetulahî rastî kurekî Ristem Paşayî nehatîye (2012, r.17) û nevîyê Mela Mistefayê Sîsî jî xwe xizmên Seydayê Liceyî dide zanîn (Qewmanî, 2011, r.17). Bi rastî jî gundê Şûşê ku cihê bav û bapîrên Mela Mistefayî ye navendeke giring a sofîgerîyê ye û dibe ku malbata Seydayê Liceyî bi mebesta îrşadê yan jî sedemeke din ji wir hatibin. Lewra di maweya jinavbirina mîrektîyên kurdan da tê ragihandin ku begên Zirkî yên Liceyê piştevanîya Mehemed Paşayî dikin (Işık, 2023, r.101) û ev jî çûnûhatin û danûstendinê di navbera van her du mîrektîyên kurdan da xweş dike. Dibe ku piştî jinavbirina Mîrektîya Soranê ev her du malbat ji wir hatibin û li Liceyê bi cih bûbin. Ji ber vê malbata Seydayê Liceyî bigihîje Ristem Paşayî yan negihîje ev ji bo me ron e ku ev malbat ji derûdora Hewlêrê koçî Liceyê dikin.

Seydayê Liceyî di dema xwe da yek ji zanayên giring ên devera xwe ye. Ji ber vê demeke dirêj li medreseyên Liceyê seydatî dike û ji ber zanatîya wî naznavê Îbnu'l Hecerî lê tê danîn (Qewmanî, 2011, r.17). Herweha di 1872ê da dema ku li vir Mekteba Ruşdîyeyê tê vekirin ji

ber heman sedemê li vê xwendingehê wek "muelimê sanî" mamostatîya fermî jî dike (Yaşar, 2012, r.110). Li ser destpêka helbestvanîya wî, agahîyeke me ya teqez nebe jî ji naveroka helbestên wî em derdixin ku ev helbest piştî nasîna wî ya Şêx Ebdulqadirî hatine nivîsîn. Ji ber vê çîroka helbestvanîya wî bi pêgirîya wî ya Neqşebendîtîyê dest pê dike û di bin karîgerîya helbest û kesayetîya Şêx Ebdulqadirî da dest bi nivîsîna helbestan dike. Ev jî nîşan dide ku Seydayê Liceyî di xwendingeha helbestî ya Neqşebendîtîyê da perwerde dibe û mînakeke tîpîk a vê bizavê ye.

Li ser nasîna wî û Şêx Ebdulqadirî tê ragihandin ku dema begên Liceyê dibihîzin ku şêxek hatîye gundê Sîsê û bûye mêvanê Ezîz Axayî, diçin pirsa wî ji Seydayê Liceyî dikin ku di qada xwe da otorîte ye. Ew jî feqîyê xwe Mela Mistefayî dişîne Sîsê da ku li ser vî kesê xerîb ji wan ra agahîyan bîne. Mela Mistefa di vegerê da bi pesindan behsa Şêx Ebdulqadirî dike û piştî demekê Seydayê Liceyî di gel feqîyê xwe Mela Mistefayê Sîsî dibin pêgirên wî (Qewmanî, 2011, r.17-18) û paşê jî wek xelîfeyên wî li vê deverê di binecihkirina Neqşebendîtîyê da roleke giring digêrin.

Seydayê Liceyîyê ku piştî mirina Şêx Ebdulqadirî (m. 1908) tenê çar salan dijî ji bilî dîwana xwe çend berhemên din jî dinivîse lê ji ber ku piştî serhildana 1925ê devera Liceyê tê şewitandin, hemû berhemên wî nagihîjine me (Doskî, 2012, r.21). Ji ber vê, halê hazir bi kurdî Tecwîdeke wî ya helbestî û dîwaneke wî ya 61 helbestî heye û ev dîwana wî ji 56 helbestên kurdî, 4 helbestên erebî û helbesteke tirkî pêk tê.

Mîna hemû helbestvanên vê serdemê ji alîyê hunera helbestvanîyê ve karîgerîyeke berbiçav a Melayê Cizîrî û ji alîyê nerîta helbesta Neqşîbendîtîyê ve jî karîgerîyeke dîyar a Şêx Ebdulqadirê Hezanîyê şêxê wî li ser wî tê dîtin. Bi vî awayî dîwana wî hem ji alîyê nerîta sofîgerîyê ve hem jî ji alîyê nerîta Neqşebendîtîyê ve ji bo destnîşankirina poetîkaya helbesta vê bizavê dibe mînakeke baş. Li alîyê din çîroka koçberîya malbata wî ji bo Liceyê ji alîyê şêwaza jîyana tevgerên sofîgerîyê ve jî rewşeke tîpîk e. Lewra di wan deman da bi mebesta îrşad û belavkirina terîqetê gelek şêxên terîqetê cih diguherînin û ev ji bo wan dibe şêwazeke jîyanê. Seydayê Liceyî jî wek wergirê vê nerîtê hem bi îlmê xwe yê medreseyê hem jî bi wergirtina xelîfetîya sofîgerîyê ji bo bizava Neqşebendîtîyê dibe mînakeke tîpîk.

Dîwana Seydayê Liceyî ji alîyê naverokê ve jî mînakeke baş a helbesta Neqşebendîtîyê ye. Ev helbest ji ber ku li ser bingeha rêbazeke civakî û îdeolojîyeke taybetî ya sofîgerîyê tên nivîsîn beşeke wan a giring xwedî naverokeke dîdaktîk in. Li gor tespîtên me ji 61 helbestên dîwanê 24 helbest li ser destûr, pedagojî û nasnameya Neqşebendîtîyê ne ku ev ji siseyan yekê dîwanê zêdetir e. Dîsa wek temamkerên vê temayê bi armanca pesindana aktorên vê rêbazê 22

helbestên medhîyeyî li ser pesindana şêxan, 5 helbestên mersîyeyî li ser mirina şêxê xwe, neatek li ser pesindana Hezretê Mihemedî û 2 munacatan li ser pesindana Xwedayî dinivîse. Herçend di helbestên xwe yên dîdaktîk da li ser felsefeya evînê gelek malik nivîsîbin jî bi awayekî xwerû li ser temaya evînê jî 7 helbestan dinivîse. Ev jî kêm zêde ji alîyê naverokê ve dîmena giştî ya helbesta Neqşebendîtîyê nîşan dide.

## 3. Pesindana Evîna Muteal Û Dijayetîya Hezkirina Dinyayê

Evîn mîna hemû rêbazên sofîgerîyê di helbesta Neqşebendîtîyê da jî felsefeya jîyanê, rêya merîfetê û çavkanîya epîstemolojîya hebûnê ye. Di vê manayê da helbestvanên neqşebendî muhebetulahê (hezkirina Xwedayî) merca sereke ya merîfetulahê (nasîna Xwedayî) dizanin ku çavkanîya nasîna tevahîya hebûnê ye. Ji ber ku “eqil” û “zanîn” amaje bi bikerîyê dikin di rêbaza evînê da tu hikumê wan nîne, di şûna wan da “dil” û “nasîn” giring û çalak in, lewra rêwîyên vê rêbazê piştî ku terka eqil û zanîna xwe ya şexsî dikin bi pakkirina dilî xwe ji bo keşifkirina merîfeta îlahî amade dikin û bi hêz û rêberîya muhebetulahê digihîjin merîfetulahê. Ji vî alîyî ve tu cîyawazîya helbesta Neqşebendîtîyê ji rêçikên din ên sofîgerîyê nîne.

Seydayê Liceyî jî wek peyrewê vê nerîtê, evînê bi ser hemû rêyên din ên merîfetulahê da digire. Ji ber vê wek zanayekî ku gelek pirtûkên dînî ji ber kirine piştî ku dide ser rêçika Neqşebendîtîyê ji rêbaza “îlm”î berê xwe dide rêbaza evînê. Lewra bi gotina wî, dema ku “tîrêjên birûska evînê derdikevin “qîlûqalên îlmê resmî” dibin “serab” û bê hikum dimînin. Ji ber vê evînê tekane rêya rasteqîne dide zanîn ku mirovî digihîjîne merîfeta Xwedê. Loma jî tevî “belakêşî” û “elemsencî”ya vê rêyê ji Xwedayî lava dike ku vî derdî lê zêdetir bike (2012, r.58).

“Qîl û qal û ‘ilmê resmî min hebûn ekser ji ber

Lami’ê berqa evînê kir tulû’ ew bûn serab” (Liceyî, 2012, r.57).

“Îlmê resmî” di nêrîna sofiyan da bi zahirê şerîetê ve girêdayî ye û ji ber “qîlûqal”ên bêsûd ji naverok û gewhera xwe dûr ketîye. Ji bo şikandina vê sûretperestîyê û balkişandina mirovan jî, helbestvanên sofî manayên erênî li metaforên heram ên mîna “mey” û “meyxane”yê bar dikin. Bi vê armancê Seydayê Liceyî bang li mirovên vê astê dike ku tu sûda “rîş û şaşik”ê nîne, bi “destnimêj û nimêja sûrî” dilê wan pak nabe û divê dilê xwe bi “mey”ê bişon (r.114, 116). Bi van gotinan bi awayekî aşkera li hember îlmên zahirî pesnê îrfana batinî dide, ji “xaneqa”yê berê xwe dide “meyxaneyê” (r.41), li wir dest diavêje fincan û tasa meyê, çavnasê reqsê dibe, pesnê dêr û kenîseyê dide, cilên durûtîyê ji xwe dike, dibe meftûnê pûtan û behsa helalîya meyê dike (r.81-83). Bêguman hemû ev merîfet li dijî eqilê zal ê civakî, bi saya evînê pêkan dibe ku heraman dike helal û rîtuel û sûretan serûbin dike.

Seydayê Liceyî, rizgarî û asayişa jîyana mirovan bi evînê mumkîn dibîne û ev, ne tenê axretê, dinyayê jî vedigire. Li gor wî dema ku mirov bi meya evînê serxweş bibe ji derd û xemên vê dinyayê jî rizgar dibe lê ev mey ne ji "meya engûrî" ye ku mirovan bi eşqa zerîyan ve girê dide û ji Xwedayî dûr dixe. Loma jî kesên ku dixwazin bi mey û benca madî derdên dinyayê ji bîr bikin nezan dizane. Li hember vê kesên ku meya evînê vexwin ji hemû "xilûxeş"ên dinyayê paqij dibin, ji bar û girêdanên dinyayî rizgar dibin, dilê wan ji eyban pak dibe, nexweşîyên wan baş dibin û di encama vê da jî dibin welî û serwerên jîyana manewî. Bi vî awayî evîn dibe kanîya her du dinyayan û behişta bêhnvedana mirovan. Ji ber vê her kesê ku ji vê kanîyê vexwe têdigihîje ku reheta dîn û dinyayê bi evînê ve girêdayî ye (r.96, 122-138).

Ji bilî bextewarîya her du dinyayan, bi nêrîna Seydayê Liceyî evîn ji alîyê qîmeta xwe ya manewî ve ji hemû gencîneyên vê dinyayê bihatir û binirxtir e. Ji ber ku Qarûnî ev sir nezanîye û daye dû komkirina gencîneyên dinyayê wî ji kesên xapîyayî dide zanîn (r.97). Li gor wî, dema ku mirov bibe xwedîyê gencîneya evînê û evîn bê hawarîya wî êdî pêwîstîya wî bi "mal, minal, fezîlet, huner û îlmê mucered" namîne. Ji vî alîyî ve evînê ji her tiştî bihêztir dizane ku dikare bibe star û penageha mirovan û wek parêzvanekî rasteqîne wan ji belayên dinyayê biparêze (r.103-104).

Helbestvan, ji bo gihîştina evînê "kuştina nefsa agirîn" û "terka îsyanê" mercên destpêkî (r.105) û "zewq" û "sidq"ê jî rêxweşkerên vê rêyê dide zanîn. Bi nêrîna wî rêwîyên rêya evînê divê nêrîna xwe biguherînin, terka "eqlê me'aş" bikin ku tenê ji bo debara jîyanê û daxwazên demkî dixebite û di şûna vê da berê xwe bidin ser "eqlê me'ad" ku paşerojê û jîyana dawî dike armanc. Ji bo gihîştina vê astê jî divê dilên xwe bi "işq"ê dax bikin da ku gemara vê dinyayê ji ser biçe û dilên xwe yên kor û lal bi xemra helal hînî "cezb û hal"an bikin da ku pêşîya xwe bibînin. Lê eger nefs terbîyeyê qebûl neke divê mîna kerê ku bi misasê tê ajotin, bi tundî pê ra serederî bikin û nefsê bi zorê bînin rayê (r.117-119).

Ji bo terbîyekirina nefsê û pêşîgirtina eqlê meaş herwek rêbazên din ên sofîgerîyê dinyayê li hember axretê biçûk dixe û hewl dide xwendevanên xwe ji hezkirina dinyayê rizgar bike. Ji bo vê di navbera mirovan û dinyayê da dijberîyekê çê dike û bi çendîn rêyan dixwaze wan ji hewesa dinyayê sar bike. Li gor wî dinya li hember mirovan bi kîn e, xwe wek bûk û binefşê nîşan bide jî "xeddar" û "dijmin" e û bi hemû "mal, weled, meqam û rutbeyên xwe" neyarê rasteqîne yê mirovan e. Loma jî ji bo wênekirina xirabîya dinyayê ji çendîn metaforan sûd werdigire, carinan wê dişibîne "eqreb û marî" û behsa "melun"î û "har"îya wê dike, carinan wê wek "mirar"ekê tîne ber çavan û hesta nefreta mirovan hişyar dike carinan jî wê dişibîne pîrejinekê ku xwe dixe kirasê bûkan û şah û mîran dixapîne. Bi heman awayî "ehlê dinyayê" jî wek kesên "canî", "har"

û “rezîl” dinasîne ku didin dû vê dinyayê. Ji ber vê bi nêrîna wî dinya wargeha êş û kederan e û ji ber vê jî “denî” û “qehpe” ye (r.86, 96, 100-104, 133, 147).

Ji bilî van sifetên nebaş ji bo sarkirina mirovan ji hezkirina dinyayê, hertim ameje bi fanîbûna wê dike. Li gor wî, dinya bi mesken, mal û minalên xwe “heyyal” e û xwedî hebûneke rasteqîne nîne. Mirov di bin dara vê dinyayê da bi awayekî şîrîn razin jî dê rojekê bergên wê darê biweşin û rastîya wê bibînin. Dinya bi vê rewşa xwe nikare bibe “qerargah”a ebedî ya mirovî û ne ew “meta” ye ku hêjayê hezkirinê be (r.86-97). Ji ber vê bi bîra mirovan tîne ku tevî hêza wan a mezin dinya ne ji Keyqubad û Xusrewî ra ne jî ji qeyser û keyên din ra bûye wargeha ewlehîyê (r.157). Lê “kordil” nebînin jî axret meqamê ebedî ye û divê mirovên pêşbîn berê xwe bidin vê armancê.

Seydayê Liceyî hezkirina dinyayê û xwestina “zêrên wê yên zer” û “zîvên wê yên qal” wek “webal” û bargiranî dibîne (r.126). Ev hezkirin, mirovan ker û kor dike û kesê ku biaqil be divê telaqê vê “bûka dinê” biavêje (r.101) û xwe jê rizgar bike. Lewra dil cihê awirdana Xwedayî ye (menzer) û divê ji “masîwa”yê (hemû tiştên derveyê Xwedayî) bê dûrkirin da ku tecelîya Xwedayî çê bibe (r.132). Ji ber vê çendê “ilimdar”îya li ser dinyayê û bîrnebirina axretê wek “delalat, bedkarî û bedqalî”yê dibîne (r.86), li hember zanîna dinyayê evîna Xwedê û axretê pêşnîyaz dike û hêvî dike ku mirov ji evînê ji xwe ra keştîyekê çê bikin û xwe ji vê “dara fena” rizgar bikin (r.169).

Herwek helbestvanên din ên rêbaza sofîgerîyê Seydayê Liceyî jî ji ber ku organ û jêdera evînê ye “dil”î ji “eqil”î balatir dibîne. Lewra dil cihê peydabûna halên manewî ye û teyîsîngeha Xwedayî ye. Loma jî ji alîyê bilindîyê ve dilî bi çîyayî dişibîne û di nav çîyayan da jî wî bi çîyayê Tûrê sembolîze dike ku Xwedê lê tecelî kirîye. Li gor wî “li çîyayê dilî” tu car bayê xurt û guregura pêt û agirî xalî nabe (r.139), vê tevgera xurt a dilî, rêya dijwar a evînê û halên manewî di helbesteke xwe da bi awayekî metaforîk destnîşan dike. Di vê helbestê da dilê wî mîna kefê ji destê wî çûye û bi dizî ji dilberê pirsa dilê xwe dike. Li ser vê dilber wî dişîne cem “zulfên bilef”, zulf berê wî didin ber “xal”ê, xal wî dişîne cem “qewsên hilal” û qews jî wî arasteyî “xedê gulgeş” dikin. Bi vî awayî hemû xweşikîyên madî yên dilberan wek rê û davên vê rêyê tên destnîşankirin, ku dil carinan dibe armanca xencerên wan carinan dilikume û dikeve çala wan û carinan jî bi awayekî bêhêvî, heyîrî û kovandar şaş û metel dimîne. Di rewşeke weha da saqîyê meyxaneyê (Şêx Ebdulqadirê Hezanî) tê hawarîyê û wî ji van metirsîyan rizgar dike (r.77-79). Seyda, maweya vê “seyr û silûk”a xwe 17 sal dide zanîn ku hîn jî bi gotina wî negihîştîye menzîla dawî (r.34). Lê tevî vê tu car ji rêberîya evînê poşman nabe û wê armanc û gewhera xwe dide zanîn.

"Her işq e rehberê te

Hem sîm û hem zerê te

Hem mêw û hem berê te

Hem bo te Xizir Îlyas" (Liceyî, 2012, r.115).

Bêguman armanca dawî û bala ya rêberîya evînê nasîna Xwedê ye. Helbestvan, hezkirina Xwedê wek jîyana rasteqîne ya "dil"î dibîne (r.133) û ew çend noqî vê evînê dibe ku ji bilî wî êdî tu tiştekî nabîne. Loma jî tekane mewcûd, mebûd û meqsûd Xwedê dizane û jê hêvî dike ku wî ji vê rêyê tu car nede şaşkirin (r.118). Ji felsefeya wî ya evînê tê famkirin ku ji bo gihîştina evîna Xwedayî divê pêşî hikumê "îlmê resmî" bê betalkirin û mirov dev ji ronahîya eqilî berde. Lewra eqilê meaş li ser roja îro û vê dinyayê hûr dibe û nikare pêşîya xwe bibîne. Lê eger daxwazên dinyayî yên nefsê bên tepisandin û dil bê terbîyekirin zemîna evînê tê amadekirin û dil bi awirdana Xwedayî (tecelî) hînî "hal"an dibe. Ji bo derbazkirina ji van halan jî perwerde, têkoşîn û rêberîya manewî pêwîst in û kengê ev merc bên bicihanîn hemû dubendî çareser dibin û mirov digihîje tewhîda evînê ku di vî meqamî da êdî ji bilî Xwedayî manaya tu heybereke din namîne.

## 4. Cureyên Helbestê Di Dîwana Seydayê Liceyî Da

Form û cureyên helbestê deravêteya naverok û felsefeya wê ne. Ji ber felsefeya evînê ya Neqşebendîtîyê helbestvanên vê rêbazê di dîwanên xwe da wek cureyên helbestê medhîye, mersîye, neat û munacatê tercîh dikin û bi van cureyan sê bikerên evînê dikin armanc ku ew jî Şêx, Pêxember û Xwedê ne. Medhîye û mersîye wek rêberên evînê ji bo şêxên neqşebendî, neat ji bo Hezretê Mihemedî û munacat jî ji bo Xwedayî tên nivîsîn. Ev rêzbendî di heman demê da mertebeyên rêbaza wan a evînî jî nîşan didin ku rêwîyên vê rêyê pêşî di kesayetîya şêxê xwe da, paşê di kesayetîya Pêxemberî da û herî dawî jî di hebûna Xwedayî da xwe fena dikin. Ji vî alîyî ve helbestvanên neqşebendî vê serborîya xwe bi van cure helbestan derdibirin û helbestê dikin wêneyên hunerî yên derbirîna van halên manewî.

### 4.1. Medhîye

Medhîye ew cure helbest e ku bi armanca pesindana kesekî tê nivîsîn. Seydayê Liceyî hemû helbestên xwe yên medhîyeyî ji bo Şêx Ebdulqadirê Hezanîyê şêxê xwe û Şêx Ebdurehmanê Taxîyê şêxê şêxê xwe dinivîse. Em dikarin bibêjin ku beşeke giring a dîwana wî ji medhîyeyan pêk tê. Ji vî alîyî ve pesindana şêxan wek taybetmendîya herî berbiçav a poetîkaya helbesta Neşebendîtîyê derdikeve pêş ku ev kesayetî rêbertî û delîlîya evîna îlahî dikin û peyrewên vê rêbazê perwerde dikin. Li hember vê rola giring a şêxan, peyrewên vê rêbazê hewl didin ku

kesayetîya xwe di kesayetîya şêxên xwe da bihelînin da ku ev rêbertî bi hêsanî û bê kêşe bê kirin. Di termînolojîya sofîgerîyê da ji vê rewşê ra "fena fî şeyx" tê gotin ku dibe destûreke giring a perwerdekirina Neqşebendîtîyê.

Ji ber vê, pesindan û wesifdana kesayetîya şêxan dibe taybetmendîyeke sereke ya helbesta Neqşebendîtîyê û helbestvanên vê rêbazê di vî meqamî da hewl didin bi her awayî kesayetîya şêxên xwe xurt û xweşik û xwe jî kêm û muhtac nîşan bidin. Bi vê mebestê taybetmendîyên edebîyata aşiqane ya rojhilatî vediguhêzine vê qadê û huner û mecazên wê ji bo xweşikkirin û bilindkirina şêxên xwe bi kar tînin. Em dikarin bibêjin ku ev taybetmendî di nav hemû helbestvanên neqşebendî da xaleke hevpar e û em şopên wê yên pêşî jî wek pêşengê vê bizavê di dîwana Mewlana Xalidî da dibînin.

Mewlana Xalid, di gelek helbestên xwe da pesnê şêxê xwe Şêx Ebdulahê Dehlewî dide û wî bi gotinên "Şahê xuban, Şah Ebdulah, Îmamê ewlîyayan û Nedîmê kîbrîya" mezin dike. Li gor wî, Şah Ebdulah mîna rojê ye û ewlîyayên din li ber wî mîna stêrka Suhayê ne. Ji ber vê jî nikarin li hember wî doza ronahîyê bikin û ev karîgerîya wî weha dike ku bajarê "kafiristanê" yê Delhîyê bi hebûna wî bibe mîna behiştê. Ji ber vê xwe li hember deryaya îhsana wî wek lêvbizirîyekî nîşan dide û xwe hêjayê axa ber lingên wî dizane (Kavak, 2009, r.21, 38-39, 55-56, 73, 444).

Em dikarin bibêjin ku li ser rêça Mewlana Xalidî hemû helbestvanên neqşebendî, şêxên xwe dikin navenda helbestê. Loma jî Şêx Ebdulqadirê Hezanîyê ku li devera Liceyê pêşengtîya Neqşebendîtîyê dike, di dîwanoka xwe da hemû helbestên xwe li dor kesayetîya Şêx Ebdurehmanê Taxî dihone. Carinan şêxê xwe bi naznavên "Şêxê Taxî" û "Şahê Taxî" diwesifîne carinan jî wî wek "babê Dîyadîn"î bi navên zarokên wî dinasîne ku di çanda kurdî da ji bo pesindanê tê bikaranîn. Li alîyê din, şêxê xwe wek qîblegeha jîyanê dibîne û wî bi wesfên dilberan dişayesîne. Ji ber vê di malikên curbicur da wî wek "şepal, şoxekî mehbûb û yekta, xwedîyê zulfên tabita, dêmşûşe, şêrînleb, Leyla, nazdar, sultan, horî, nazenîn, dilber, can û delal"ê dişayesîne û wî dike kirasê dilbera edebîyata aşiqane. Li hember vê mezinkirina şêxê xwe, xwe jî kêm dike û dixe asta "segê dergaha wî, asîyekî şermende, Mecnûn, gunehkar, tûle, rûsîyah, esîr û qitmîrê asîtana wî" (2016, r.12-53).

Seydayê Liceyî jî li ser rêça van pêşengan şêxê xwe dike navenda helbestê û di piranîya helbestên xwe da pesnê kesayetîya wî dide. Ew jî ji bo estetîzekirina şêxê xwe wî bi taybetmendîyên dilberan dişayesîne û xweşikbûna wî ya ruhî bi xweşikbûna madî ya jinan wêne dike. Wek helbestvanên din ên neqşebendî ew jî van mecazên helbestî serberdayî û şêlû nahêle

û di dawîya helbestên xwe da bi navhildana şêxên xwe armanca xwe aşkera dike. Lewra helbestvanên vê nerîtê ji ber şayişên rêxistinî û rêgirtina têgihîştina çewt di cih da pêşî li berfirehîya manayî ya helbestê digirin û berê xwendevanên xwe didin ser kesayetîya şêxên xwe. Ji ber vê Seydayê Liceyî di dawîya helbestên weha da, şêxên xwe bi naznavên "Şahê Hezanî, Geylanîyê Sanî, Şeyx Ebdulqadir, Qutbê Hezan, Şahê şirîn, Babê Şêrîn, Babê Selîm, Babê Emîn, Babê Zîyadîn, Şehê Taxê, Seyda" (r.35-44, 61-63, 71-76, 134) bi nav dike û bangeşeya kesayetîya wan a karîger dike.

Helbestvan wek stratejîya pesindana şêxên xwe Şêx Ebdulqadirê Hezanî û Şêx Ebdurehmanê Taxî bi wesfên dilberan wêne dike û wan di şûna dilberên edebîyata aşiqane ya rojhilatî da bi cih dike. Li gor wî birûyên hebîba wî qewsî ne, bejn û bala wî wek gul û neyê ye, çavên wî cadûyî ne, lêvên wî wek qedê ne, kenên wî şîrîn û şekirîn in, ji alîyê nazikîyê ve mîna gulê ye, dişibe melek, perî û horîyên behiştê. Her du zilfên wî yên enberkirî ji bejna wî tên xwarê û bi vî awayî derman, dewa û şîfayê dibexşînin aşiqan, gîsoyên wî yên muetter û terrar bi bayê sibehê celalekê didine dilê helbestvanî. Qameta wî mîna ‘er‘erê ye, du kezîyên wî mînane du şehmar û şevên dirêj, şox û şeng û dildar e, ji kulîlkan dişibe sorgul û nêrgizê. Didanên wî mîna dur û le'lan, lêvên wî mîna mahtabê, birûyên wî wek "nûn"ê, devê wî mîna "mîm" û xunçeyê, çavên wî mîna "sad" û nêrgizê, dêmên wî mîna durê, rûyê wî yê al mîna gulnar û sibehê, kakulên wî wek şevên yeldayê, bedena wî mîna sîmê, bejna wî wek serwê ye û bi vê xweşkîya xwe dîn û dilî ji her kesî dibe. Şêxê wî yê xoşewîst çavxezal e, perîsuret û delal e, şêrîndehan û şêrînkelam e, caduwên wî ji bin guhan ve mîna sîman xuya dikin, zerîyeke zêrîguhar e, çav belek e, zulf xelek e, le'l zulal e, kakûl keş e, xal hebeş e, hacib reş e, lêvşekir e, hûr peyker e, tac li ser e, zêrkemer e, qewsên porê wî desas in û ji nav rindên dîrokî dişibe Belqîsê. Şêx bi vê xweşikîya xwe mîna dilberên dilhişk ên edebîyata Rojhilatê helbestvanî bi mijangên xwe dike armanca tîr û xedengên evînê, mal û minalên wî talan dike û can û cesed û cigera wî dişewitîne. Loma jî gelek caran bedena helbestvanî mîna tenûrê dişewite, sebra wî namîne, ji xwe diçe, ji hemû rutbe û malên dinyayê tê şemirandin û dîsa hawar û gazîya xwe dibe ber şêxên xwe ku yê pêşî li Hezanê û yê din jî li Hîzan û Nûrşînê ye (r.29-95, 149-150, 170).

"Ya Reb çi bê wefa ne ev dilberanê cado

Dikujin kefen jî nakin kuştiyê xet û xalî

Ebrû hilala rûroj, sînesedef, didandur

Şeb zulfan gîso ‘enber kuştim bi yek xiyalî" (Liceyî, 2012, r.34).

"Qîza rezan waye li Hezan

Her çi nezan mehrûm bû” (Liceyî, 2012, r.69).

Seydayê Liceyî, şêxê xwe ne tenê bi wesfên dilberan estetîze dike, li ser nerîta helbesta sofîgerîyê carinan ji bo nîşandana hêza wî ya manewî, wî bi wesfên celalî yên şah û padîşahan jî dişayesîne. Ev yek, di binavkirina navên şêxan da jî xwe nîşan dide ku hema bibêje hemû helbestvanên neqşebendî şêxên xwe bi naznavê “Şah/Şeh”î dinasînin. Seydayê Liceyî jî mîna pêşîyên xwe şêxê xwe wek “şah, sultan, key, xaqan, qeyser, xan serwer, serdar, emîr”î dinasîne û ji bo ku ji hêza wî ya manewî ra bibe remz wî ji qehremanên dîrokî dişibîne Rustemê Zal (r.29-87, 152).

Li hember vê navendîyeta şêxî hemû mirovên li dora wî û bi taybetî jî murîdên rêbaza Neqşebendîtîyê wek mirovên berkar, muhtac û aşiqên belengaz wêne dike. Ji vî alîyî ve murîd şûna aşiqên navdar ên mîna Mecnûn, Ferhad û Wamiqî (r.53) werdigirin û şêx jî dilberên nazdar. Helbestvan li ser navê xwe vê rewşê bi çendîn metaforên helbestî berbiçav dike ku ji ber firqeta şêxî rûyê wî mîna pelên payîzê zer dibe, bi ah û fîxan şev û rojan dinale û navê wî dubare dike, mîna hîlalê lawaz dibe, ji xeman mîna tîpa “dal”ê xwar dibe, ji ber belengazîyê dikeve halekî weha ku heşt wesfên zekatxuran lê peyda dibin, ji êşan birîndar dibe û dûrbûna ji şêxê xwe mirin dizane. Ji ber vê xwe li hember mezinahîya wî “esîr, bênewa, feqîr, mubtela, merîz, bêdewa, gunehkar, birîndar, bêzar, muflis, neçar, bêkes, xaşak, xar û xes, sotî, naçiz, hezîn, ebkem, kerker, miskîn, qitmîr, cewr” dide zanîn, xwe dişibîne seyê ber derîyê wî û hezaran kesên mîna xwe qurbana wî dike û (r.29-43, 58-63).

“Ez bendeyê naçar û segê derge me her dem

Tu Şahê sifet cem

Ez kelbê derê Şahê Resûlanê Hezan im

Herçend nizanim” (Liceyî, 2012, r.67-68).

Ji bilî vê metafora aşiq û maşûqa edebîyata aşiqane di pesindana kesayetîya şêxê xwe da bal dikêşe ser rola wî ya rêberî û vejînerîyê jî. Lewra dema ku helbestvan pêşîya xwe nabîne, tu dengî nabihîze, bê hiş, tevlihev, neçar û nexweş e, şêx bi feyza Xwedayî wî dewa dike, wek serafê mirovan gîyan dibexşe wî, wek Îsayî dilê wî vedijîne û wî ji karên xirab û birînên manewî rizgar dike (r.45-47, 51). Ji ber vê rola wî, Şahê Hezanî wek roja îslamê û qutbê zeman dide zanîn ku bi xebata xwe “fisq û delalet”ê radike û îslamê geş dike (r.37-39). Bi vî awayî şêxê xwe wek ruh û navenda “daîreya işqê” dide zanîn ku her kes li dora şemala wî mîna hîlalê dibe

perwane. Ji ber van taybetmendîyan di wê bawerîyê da ye ku ji alîyê kemalata mirovî ve ji bilî pêxembertîyê Xwedê hemû fezîletên bala daye şêxê wî (r.62).

Der daireyê 'işqê tu yî merkez û 'umde
Her dil bi te qesd e
…
Her kes ku şemala te wî dî bûye hilal e
Perwane mîsal e
'Alem hemî yek cism û di wê tu wekî rûh î
Ya şûbhetî yûhî (Liceyî, 2012, r.40).

Dîyar e, helbestvanên neqşebendî ji ber felsefeya xwe ya evînê û fenabûna di kesayetîya şêxî da terkkirina hemû taybetmendîyên "ez"a xwe merîfet dizanin û weha bawer dikin ku bi vê terkê digihîjin kemalê. Lewra di pedagojîya vê rêbazê da dil li hember eqilî, evîn li hember ramanê, axret li hember dinyayê tê danîn û mirovên weha tên perwerdekirin ku çend dest ji îdîayên xwe yên dinyayî û hêza xwe ya gewherî berdin ew çend baş e. Ji ber vê helbestvanên neqşebendî çawa ji bo pesindana kesayetîya şêxî ji îmaja dilbera hikumdar a edebîyata rojhilatî sûd werdigirin di wênekirina helbestvanê aşiq da jî ji îmaja aşiqê bende yê lawaz sûd werdigirin. Loma jî şêx wek tekane biker, çend bê mezinkirin pêgirê rêbaza wî jî wek berkarekî ew çend tê biçûkkirin. Ji ber vê têgihîştinê di helbesta Neqşebendîtîyê da helbestên medhîyeyî ji hemû cureyên din ên helbestê zêdetir in.

### 4.2. Mersîye

Mersîye ji ber xema mirina kesekî tê nivîsîn û di helbesta Neqşebendîtîyê da ev kesên giring şêx in. Ji ber vê hema bibêje hemû helbestvanên neqşebendî li ser mirina şêxên xwe mersîyeyan dinivîsin. Ji vî alîyî ve mersîye jî mîna medhîyeyê dibe yek ji taybetmendîyên berbiçav ên helbestvanên neqşebendî. Çawa ku Şêx Ebdulqadir li ser mirina şêxê xwe mersîye dinivîse Seydayê Liceyî jî li ser mirina wî çar mersîyeyên kurdî û mersîyeyeke bi tirkî dinivîse û êş û azara xwe ya dilşewatane derdibire.

Seydayê Liceyî di mersîyeyên xwe da li ser mirina "Şahê Hezanê" dîyar dike ku dilê wî ji derd û xeman tijî ye, bi şev xew nakeve çavên wî, bi can û ciger fîxan dike, ji derdan jar dibe, mîna pelên payîzê zer dibe, cih lê teng dibe, dinya di çavên wî da reş dibe, hêsirên wî mîna çemî tên xwarê, sebr û qerara wî namîne, ji dev û çavên wî xwîn tê, nûra dilê wî vedimire û bask û milên wî dişikin. Ji ber vê dehşetê nizane çi bike, bê ku haya wî jê hebe berdewam dinale. Lewra piştî mirina Şêx Ebdurehmanê Taxî û Xewsê Hîzanê êşa "Geylanîyê Sanî" wî dîn û sewda dike. Ji ber vê nikare vî derdî bi tu pîvanekê destnîşan bike û berdewam pirsa şêxê xwe dike. Herçend cihê wî "cennetul ne'îm" bizane jî ji bo teselîkirina xwe çawa ku Hezretê Omer mirina

Pêxemberî înkar dike ew jî mirina şêxê xwe înkar dike. Ji ber vê rûdanê ew çend êş dikêşe ku bi dîtina wî heta serê xwe daîne ser xiştî jî dê bi hesreta şêxê xwe bişewite. Lê ji ber mirina "Qutbê Hezanê" ne tenê ew, hemû alem dinalin, dikalin û hawar dikin. Lewra kê ji lêvên wî yên zelal şerbetekê vexwaribe û beşdarî suhbeta wî bûbe bi wî ve hatîye girêdan. Ji ber vê jî mirina wî her kesî diêşîne, wan mat dihêle û jîyanê li wan reş dike (r.172-177, 183).

Bi vê munasebetê dîsa wesfên wî yên bilind derdibire ku di maweya jîyana xwe da dibe "kana lutfa îlahî, kanîya feyza Xwedayî, çîyayê îrfanê, erşê Rehman, mexzena îlm û weqarê, murşîdê Yezdan, sultanê aşiqên kubar, kana rastî û qencîyê, welîyê pur huner, heblul-metîn, misbaha dîn, meşela nûra Celal, nûra Xwedayê layezal". Ji ber van taybetmendîyên xwe di dema xwe da dilên mirovan bi cemal û celala xwe derman dike, nefsa wan ji qîlûqalên vala rizgar dike, bi rêya evînê esasek ji dil û dînî ra datîne û dibe warisê rasteqîne yê Pêxemberî" (r.172-181).

Di helbestê da peyv û risteyên dubarekirî ji bo nîşandana cext û giringîya mijarekê tên bikaranîn û helbestvan di van her çar mersîyeyan da bi risteyek yan du risteyên serbendî karîgerîya mirina Şêx Ebdulqadirî cext dike û dubarekirinê jî wek taybetmendîya helbestên mersîyeyî bi kar tîne. Di van her çar mersîyeyan da van serbendan bi kar tîne ku hemû jî nîşaneya êş û xema wî ne:

> Cumle ‘alem derdmend e ji firqeta Şahê Hezan
> Pur dikin nalîn û kalîn û fîxan pîr û ciwan (Liceyî, 2012, r.172-174).
>
> Wa firqetê wa firqetê (Liceyî, 2012, r.175-178).
>
> Ji derd û hesreta Geylanîyê Sanî birîndar im
> Ji derdê firqeta Şahê Hezan daim elemdar im (Liceyî, 2012, r.179-181).
>
> Hesret û derdê firqetê (Liceyî, 2012, r.181-184).

### 4.3. Neat

Neat, di bingeha xwe da "medhîye" ne (Adak, 2019, r.154) lê di edebîyata îslamî da bûye navê taybetî yê pesinnameyên Hezretê Mihemedî. Di dîwana Seydayê Liceyî da tenê neatek heye û ew jî bi erebî ye.

### 4.4. Munacat

Munacat li ser mezinahî û pesindana Xwedayî tên nivîsîn û helbestvan bi dua û lavayan xwe diavêjine Xwedayî da ku wan bibexşîne. Seydayê Liceyî du munacatan dinivîse lê van her du

munacatên xwe dîsa têkelî medhîyeyên şêxan dike. Lewra şêx ji bo wî di gihîştina Xwedayî da rêber e û ji ber vê mebestê jî şêxê xwe bi bîr tîne û pesnê wî dide. Di van munacatan da gilîya nefse dike, behsa bêmanabûna hezkirina dinyayê û rewşa xirab a mirovên serdema xwe dike û "walî, sedr û sultanên" dema xwe dişibîne guran ku dest datînin ser mal û pereyên belengazan. Ji ber vê destê xwe ji vê dinyayê dişo û ji navên Xwedayî mededê dixwaze. Ji bilî vê bi mixabinî dîyar dike ku temenê wî bi hewa û hewesê derbaz bûye û di xefletê da maye. Ji ber vê ji Xwedayî hêvîya rehmê dike, jê lava dike ku hezkirina vê "dinyaya denî" ji dilê wî derîne, "nefsa wî ya genî" bîne îtaetê û "şeytanê leîn" jê dûr bixe (r.64).

'Umrê min çû bi hewa û hewes û bê xeberî
Mame der xeflet û der hîret û der bê hunerî
Her bi rehmê xwe li ser min veke Rebbî tu derî
Lew ji mêj ve dikişînim xem û derd û kederî
Tu xenî û tu kerîm û tu rehîmê di berî (Liceyî, 2012, r.64).

## 5. Nasname û Pêdagojîya Neqşebendîtîyê di Dîwana Seydayê Liceyî da

Neqşebendîtî hem tevgereke civakî ye hem jî xwedî riwangeheke taybetî ya nasname û pedagojîyê ye. Ev nasname û pedagojî li dîwan, xaneqa û medreseyên wan di çarçoveya mufredatekê da, di nav civakê da bi rêya menqîbe û kerametên şêxan û di qada edebîyatê da jî li ser destê helbestvanên neqşebendî tê pêkanîn û ev jî dîdaktîzma vê rêbazê nîşan dide. Seydayê Liceyî li ser nerîta pêşîyên xwe di dîwana xwe da rengûrûyên vê nasname û pedagojîyê dîyar dike û beşdarî berhemanîna dîdaktîzma helbesta neqşebendî dibe.

Destnîşankirina rehên dîrokî û navanîna nûnerên sereke, di nasnamesazîya her komeke civakî da xwedî giringî ne. Ev di rêbaza Neqşebendîtîyê da teqabûlî sîlsîleya manewî û kesayetîyên giring ên vê sîlsîleyê dike, lewra hildana navên van kesan hem ji alîyê reh û dîroka vê tevgerê ve hem jî ji alîyê derxistina nerîta wê ve giring e. Mewlana Xalid wek pêşengê vê bizavê, yek ji wan helbestvanên neqşebendî ye ku di çendîn helbestên xwe da behsa sîlsîleya vê rêbazê dike û navên nûnerên giring ên her du baskên vê sîlsîleyê rêz dike ku ji Hezretê Elî, îmamên ehlê beytê, Hezretê Ebubekirê Sidîq, Selmanê Farisî, Ebu Yezîdê Bîstamî, Mihemed Baba Semmasî, Seyîd Emîr Kîlal, Bahaedînê Neqşebend, Ehrar, Mihemed Zahid, Derwêş Mihemed, Îmam Rebanî, Mihemed Mesûm, Alaudîn Etar, Yaqubê Çerxî û Canê Canan (Şemsudîn Hebîbulah) pêk tên (Kavak, 2009, r.72-94, 322, 362, 543, 557, 580-581).

Seydayê Liceyî li ser vê rêçikê, ji bo wesifdana Şêx Ebdulqadirî ji hêza manewî ya sîlsîleya Neqşebendîtîyê sûd wedigire û ji bo nîşandana vê reha bihêz carinan navên hin kesayetîyên giring ên vê sîlsîleyê hildide. Şahê Buxarayê (Bahaeddîn Neqşebend) (1318-1391), Elauddînê Etar (m. 1399), Ubeydulahê Ehrar (1404-1490), Şemsudîn Hebîbulah (1701-1781), Xews (Şêx

Sibxetulahê Ervasî) (m. 1870) û Ebdurehmanê Taxî (1831-1886) ji van kesan in ku wan dişibîne stêrk, heyv û rojê, bi navê wan sond dixwe û wan dike şefaetkarê xwe (r.29-43, 101).

Li ser destê kesayetîyên giring ên neqşebendî bi demê ra rêbazeke taybetî ya perwerdekirinê peyda dibe ku di lîteratura vê rêbazê da wek "kelîmeyên qudsîye" tên binavkirin. Li gor çavkanîyan cara pêşî Ebdulxaliq Xujdevanî (1103-1179) heşt destûrên vê rêbazê destnîşan dike (yad kerd, baz geşt, nîgah daşt, yad daşt, hoş der dem, nezer ber qedem, wuqufê zemanî, wuqufê ededî, wuqufê qelbî) û Bahaedîn Neqşebendî jî bi lêzêdekirina her sê destûrên "zikra xefî, sefer der veten û xelvet der encumen"ê hejmara wan digihîjîne yazdehan (Weismann, 2015, r.81-83). Neqşebendîtîya Xalidî van yazdeh destûran di bin navê çar rêyên gihîştina Xwedayî da kom dike ku ji suhbet, rabite, zikir û muraqebeyê pêk tên (Bağdâdî, 2000, r.105-114). Em di dîwana Seydayê Liceyî da jî rastî van taybetmendîyên pedagojîya Xalidîtîyê tên û ev jî nîşan dide ku helbestvanên neqşebendî di binecihkirina van destûran da roleke giring digêrin.

### 5.1. Suhbet

Çavkanîyên Xalîdîtîyê "suhbet"ê rêya herî hêsan û kurt a gihîştina Xwedayî dinasînin. Suhbet şêweyeke perwerdekirinê ye. Di destûra "suhbetê" da şêx dibe navgîn û veguhêzê feyza îlahî û murîd jî bi amadebûna xwe dibin wergirên vê feyzê. Bi vê rûbirûbûnê hemû tecelî û îmdadên Xwedayî bê dijwarî derbazî murîdan dibe û bê ku haya wan jê hebe di kesayetîya wan da guherînên bisûd çê dibin (Algar, 2007, r.238). Weismann suhbetê pêwîstîyeke destûrên "sefer der veten" û "xelvet der encumenê" dizane (2015, r.84). Lewra ji ber dûrketina ji civatê û rêwîtîya manewî ya "salikê rêya manewî" ev kes gelek caran rastî astengan tên û bi xêra suhbetê ev asteng û perdeyên manewî radibin.

Di lîteratura sofîgerîyê da merîfeta Xwedayî di mirovî da raçandî ye û ev merîfet bi rakirina perdeyên nefsê tê keşifkirin. Sofî ji her mertebeyeke nefsê ra "weten" dibêjin û rêwîyên heqîqetê bi rakirina van perdeyan ber bi kemal û nasîna Xwedayî ve bi pêş ve diçin (Kılıç, 2012, r.29). Neqşebendî ji vê rêwîtîya cîhana navxweyî ra dibêjin "sefer der veten" (Algar, 2007, r.15) ku di her qonaxeke vê rêwîtîyê da merîfetek tê bidestxistin. Ji ber vê Seydayê Liceyî "hubul weten mînel îman"ê di vê manayê da werdigire (r.72) û dîyar dike ku "welat ne mîna Şam û Îraqê" cihekî berbiçav e, belkî welat "mexzena esrarê" ye ku merîfeta Xwedayî tê da veşartî ye û bi arîkarîya suhbetê perdeyên li ser van siran tê rakirin û nasîna welatê rasteqîne çê dibe. Bi vî awayî şêx wek "heyveronek"ê dawî li tarîtîya nefsê tîne û hezkirina wetenê manewî diavêje bedena wan.

"Ji îmanê ye hubbê weten ey arifê exbar

Ne Şam û ‘Iraq e weten ey mexzenê esrar

Serdest li ‘erşê ‘alemê rûhê weten ey yar

Irsal bi weten pênc letaif ke tu yek yar

Der sohbetê wî dilberê mehbûbê Xwedayî” (Liceyî, 2012, r.49).

Ji ber vê giringîya wê Seydayê Liceyî di dîwana xwe da cihekî berfireh dide suhbetê û wê wek destûra herî giring a pedagojîya Neqşebendîtîyê derdixe pêş. Lewra “tecelî”ya ku mirov bi sed salên îbadet û zuhda hişk û bênûr nikare bi dest bixe dikare di saeteke suhbetê da bi dest bixe. Li gor wî, suhbet feyz û futûh (vekirin) e û eger murîd bi muhebet, teslîm û sidq berê xwe bidin suhbetê dê dilên wan ronî bibe û esrarên rehmanî bibînin. Bi aşkerabûna van siran feyz wek kanîyê diteqe û tecelî çê dibe. Ji ber vê feyz û tecelîyê zewqeke manewî çê dibe û saeteke suhbetê ji sed salên zuhda hişk û bênûr sûdmendtir dibe. Suhbet ne tenê feyz û zewqê dibexşe, di heman demê da dilên murîdan ji nexweşîyên manewî pak dike û ji wan ra dibe derman. Berevajî eger dilên wan bi suhbetê neyên geşkirin dê mîna qîrê, reş bibin û ji nexweşîyên manewî rizgar nebin. Ji vî alîyî ve dûrketina ji suhbetê wek mirin, gihîştina wê wek jîyan û meclisa suhbetê jî bi gul, binefş û behiştê berbiçav dike. Loma jî bang li rêwîyên vê rêbazê dike ku ji bo dilên xwe “rewşen” bikin divê her sibeh û êvar li dergahê di suhbeta “ehlê dilan” da rûnin û ji şêxên xwe “meded”ê bixawzin (r.30-82, 98-103, 106-143).

“Sa‘etek sohbet li nik ehlê dilan Hadî bizan

Çêtir e ji sed salî zuhda xişk bê nûr û şu’a’” (Liceyî, 2012, r.131).

Helbestvan li ser nerîta helbesta sofîgerîyê aktor (şêx-murîd), perwerde (feyz) û cihê suhbetê (dergah) carinan bi metaforên edebîyata aşiqane ya rojhilatî jî wêne dike. Loma jî şêxî wek “dilber, saqî, pêşrewê dêra muxan”î, murîdî wek “rind”î, feyza manewî wek “mey”ê û dergahê jî wek “meyxane”yê sembolîze dike. Saqî li meyxaneyê meyê digerîne, wan pêşî bi serxweşkirinê dimirîne û paşê perdeyê ji ser dilên wan hiltîne. Bi vî awayî murîd peymana “elest”ê bi bîr tînin û çavên xwe li jîyaneke ebedî vedikin. Helbestvan vê rewşê dişibîne rûdana Mûsayî ya li çîyayê Tûrê ku pêşî ji ber şîdeta tecelîyê ji xwe diçe paşê dibe mezherê feyza îlahî ku mîna ewrên nîsanê bi ser da dibare. Lê hemû ev hal û teşbîh ji bo “ehlê hal” in û divê li ber “abid” û “sofîyên xam” neyên aşkerakirin, lewra ev kes heta ji vê meyê venexwin nikarin sira “kas û cama meyê” fam bikin (r.31, 75, 111, 139).

### 5.2. Rabite

Rabite yek ji reformên Mewlana Xalidî û cîyawazîyeke giring a pedagojîya Neqşebendîtîya Xalidî ye. Di rabiteyê da murîd şêxê xwe tînin ber çavên xwe û dema ku ji suhbeta wî dûr

dikevin bi vê wênekirinê hewl didin li hizûra wî ya manewî amade bibin û feyza îlahî ya ku di dilê şêxî da veşartî ye, derbazî dilên wan bibe. Rabite dibe sedem ku murîd bi hezkirineke zêde bi şêxê xwe ve bê girêdan û di dûrîyê da jî jê veneqete û ji manewîyata wî sûd wergire. Mewlana Xalid rabiteyê rêya pevgirêdan û xwefenakirina murîdî dibîne û heqîqeta vê jî dispêre hin ayetên Quranê ku rê li ber wesîleyên gihîştina Xwedayî vedikin. Bi palpiştîya van ayetan dîyar dike ku di rabiteyê da dema ku murîd bi rêya xeyalê berê xwe didin nava her du çavên murşîdê xwe bi rêberîya wî digihîjîn Pêxemberî û bi rêya Pêxemberî jî digihîjin Xwedayî (Bağdâdî, 2000, r.15-17). Bi vê girêdana manewî, şêx di navbera murîd û Xwedayî da erkeke navberkar a giring bi cih tîne.

Ji ber vê giringîya rabiteyê Algar dîyar dike ku herçend zikir di rêbaza sofîgerîyê da îbadeta herî bingehîn be jî Mewlana Xalid û xelîfeyên wî rabiteyê bi ser zikirê da digirin. Loma jî rabite di rêbaza Xalidîtîyê da cihekî navendî digire û bi vê destûrê Mewlana Xalid hem serokatîyeke bihêz hem jî dîsîplîneke navendî çê dike. Bi vî awayî heta dawîya sedsala 19ê wek destûreke vê rêbazê hemû peyrewên Neqeşebendîtîya Xalidî piştî mirina wî jî ne bi xelîfeyên wî ra, bi Mewlana Xalidî ra rabite dikin. Lê di dawîya sedsala 19ê da ev nerît tê terikandin, êdî her murîd di gel şêxê xwe rabite dike û rabite ji fonksîyona xwe ya çêkirina serokatîyeke navendî dûr dikeve (2007, r.243-245).

Em di dîwana Seydayê Liceyî da bi tu awayî rastî navê Mewlana Xalidî nayên. Ev jî nîşan dide ku di dema wî da rabiteya bi Mewlana Xalidî ra hatîye terikandin. Em ji pesindanên wî yên zêde têdigihîjin ku rabiteyê bi Şêx Ebdulqadirê Hezanî ra dike. Ji ber ku rabite bi hêza xeyalê tê kirin Seydayê Liceyî şêxê xwe bi wesfên xweşikîya jinan û hêza şah û desthilatdaran wêne dike û em dikarin bibêjin ku ev şayesandin encamên edebî yên rabiteyê ne. Helbestvan di helbesteke xwe da amaje bi vê taybetmendîya rabiteyê dike û bi vê rêyê “zulf û rux û xalên hebîbê” tîne xeyala xwe.

“Zulf û rux û xalê hebîb

Bîne xeyalê ger lebîb

Rabite ke bi wechê ‘ecîb

Dê ew bibit xweş xîzexîz” (Liceyî, 2012, r.111).

Em dikarin bibêjin ku navendîyeta şêxî di poetîkaya vê bizavê da ji alîyekî ve xwe dispêre rabiteyê û helbestên medhîyeyî yên Seydayê Liceyî bi giştî çavkanîya xwe ji vê destûrê werdigirin. Lewra xeyal û berbiçavkirina şêxî ya ku bi saya rabiteyê çê dibe di hişê helbestvanên

neqşebendî da bi hêsanî vediguhere wêne û îmajên helbestî û ji ber vê jî cemala wî di sûretê jinê da celala wî jî di sûretê mîr û şahan da tê nîşandan.

### 5.3. Zikir

Zikir di hemû rêbazên sofîgerîyê da yek ji destûrên giring ên perwerdeya manewî ye û di Neqşebendîtîya Xalidî da jî stûna sêyem e ku destûrên "yad kerd" û "yad daşt"ê li xwe digire. Çawa ku li jor hat destnîşankirin ev destûr piştî Bahaedîn Neqşebendî wek zikra xefî tê pênasekirin û dibe yek ji taybetmendîyên vê rêbazê. Ji ber vê Seydayê Liceyî di dîwana xwe da amaje bi vê destûrê dike û dîyar dike ku divê dil bi zikrê bê daxkirin da ku mirov bikare xwe ji astengên madî yên vê dinyayê rizgar bike û selameta dilî bi dest bixe.

"Qelbê selîm e xaşi'

Der heşr û neşr e nafi'

Ewlad û mal e mani'

Ku dil bi zikrî be dax" (Liceyî, 2012, r.132).

Berevajî rabiteya ku hêz dide îmaja helbestî, zikra veşartî ya Neqşebendîtîyê rê li ber têkilîya helbest û muzîkê digire û vî alîyê helbestê lawaz dike. Muxalefeta qadirîyan jî di vê xalê da dîyarker e û dibe sedema tundîya helbestvanên neqşebendî. Seydayê Liceyî ji bo ku bi qadirîyên reqîb ra neyê tevlihevkirin taybetmendîyên wan ên "def, reqs û dîlan"ê wek "halên heram" dide zanîn û vê rêbaza wan bi kufrê tawanbar dike (r.143).

### 5.4. Muraqebe

Muraqebe yan jî bi navê xwe yê din "nîgah daşt" destûra "wuqufê qelbî" jî li xwe digire û tê manaya çavdêrîyê ku rêwîyê rêbaza sofîgerîyê berê xwe dide cîhana xwe ya navxweyî, li ser Xwedayî diponije, xwe noqî zatê wî dike û hebûna xwe ya îzafî di nav hebûna wî ya mutleq da dihelîne. Bi vî awayî bi saya muraqebeyê daxwazên nefsî tên jinavbirin û bi teslîmîyeta Xwedayî mirov di kesayetîya wî da rengê beqayê werdigire (Algar, 2007, r.238) ku ev jî pileya herî bilind a manewî ye ji bo mirovî. Seydayê Liceyî di hin helbestên xwe da vê rewşê bi gotinên nerasterast berbiçav dike. Li gor wî mirov bi hêza evîna Xwedayî dikare "nefsa narî" bikuje (r.105). Loma jî ji Xwedayî lava dike ku mirovî ji mirovî yanî ji nefs û şeytanê wî rizgar bike da ku rê li ber gihîştina beqayê bê vekirin (r.141). Em dikarin hemû munacatên wî berhemê vê destûrê bihesibînin.

## 6. Bangeşeya Rêbaza Neqşebendîtîyê

Mîna piranîya rêbazên sofîgerîyê, Neqşebendîtîya Xalidî jî xwe dispêre rêxistineke civakî û helbestvanên vê rêbazê di helbestên xwe da bangeşeya vê terîqetê dikin. Edebîyata ku di nav

têkilî û tora rêxistin û komên civakî da tê berhemanîn jî bibêjî nebêjî heta radeyekê xwe dispêre dîdaktîzm û propagandayê. Di vê manayê da helbestvanên neqşebendî wek pêgirên vê tevgerê ji vê qanûna giştî veder namînin. Ji ber vê ji bo nîşandana giringîya rêbaza xwe heta ji destê wan tê jîyana dinyayê biçûk dixin û ji bo têgihîştina rastîya vê dinyaya derewîn behsa rêberî û rizgarkerîya şêxên xwe dikin.

Seydayê Liceyî vê rewşê bi çendîn metaforên helbestî derdibire û dîyar dike ku kî “camek meya nahil” ji destê “pîrê meyxaneyê” vexwe dê heqîqetê li ber çavên xwe bibîne. Di vê çarçoveyê da wek delalê ku dixwaze malê xwe bi qîmet bike behsa “şereba wehdet û dîn” a Şahê Hezanê dike ku ji Nûrşînê anîye. Li gor wî ev şerab her roj nayê bazarê û eger kiryar wê nekirin dibe ku careke din bi destê wan nekeve (r.32). Ji ber vê di gelek helbestan da pesnê kesayetîya şêxê xwe dide û dîyar dike ku di dema wî da kesekî mîna Şahê Hezanê nîne. Li gor wî kesê ku dilê wî kor nebe dikare vê rastîyê bi çavê serê xwe bibîne û ji Xwedayî lava dike ku vê korbûna dilan rake da ku qutbîyeta wî ji alîyê her kesî ve bê dîtin (r.50).

Ji bo nîşandana mezinahîya Şêx Ebdulqadirî behsa cîyawazîyên wî dike û ji alîyê xwe ve sedema hilbijartina wî wek rêberê manewî destnîşan dike. Li gor wî herçend di dema wî da li derûdorê gelek şêx hebin jî tu kes bala wî nakêşe lê dema “qutbê heqanî” ji gundê Resûlanê “bi keyanî” tê Hezanê û bi “nefesa wî” muşeref dibe “neqşek” li dilê wî tê danîn. Ji ber vê bi saya “Ebdulqadirê Sanî” dibe “neqşî”, digihîje deryaya suhbet û cezbeya wî û “dewlet”a rasteqîne. Ji ber vê ji Xwedayî lava dike ku zewal nedê û “meyxane”ya wî berdewam şên bike da ku gelek kesên mîna wî “yaqûtê meya al” binoşin (r.88).

“Hîna ji Resûlan kire teşrif bi keyanî

Ew qutbê heqanî

…

Xweş tali’ê se’de ku ji enfasê dehanî

Neqşek li wî danî” (Liceyî, 2012, r.68).

Seydayê Liceyî piştî ku kesayetîya şêxê xwe bi van gotinan mezin dike vê carê berê xwe dide murîdan da ku hovîtî û kovîtî nekin, nebin sofîyên fenrovî û di dilên xwe da tovên rastîyê biçînin. Li gor wî mirov sed sal îbadet jî bikin eger di suhbeta şêxî da amade nebin nikarin bibin mezherê tecelîyê (r.30). Lewra şêxên neqşebendî di demeke kurt da li dilan “neqşên nûranî” dineqişînin û wan digihîjînin armancê. Ji ber vê li gor wî kesê ku nebe “neqşî” nikare ji derdan xilas bibe. Loma jî dîyar dike ku berî ku mirov li “ne’şî” siwar bibin divê bi evîna şêxên “perîrû”

yên neqşebendî ji zindana nefsê xwe rizgar bikin û letaîfan keşif bikin. Bi vî awayî helbesta xwe dixe bin xizmeta bangeşeya rêxistina Neqşebendîtîyê û erkeke rêxistinî li helbestê bar dike (r.171).

## ENCAM

Neqşebendîtîya Xalidî di nîvê duyem ê sedsala 19ê da dibe sedema peydabûna bizaveke civakî û xwendingeheke helbestî ya taybetî. Ji alîyê poetîk ve helbestvanên neqşebendî li ser nerîta helbesta sofîgerîyê li hember eqil û zanistên eqlî berê xwe didin evîneke muteal û hezkirina dinyayê biçûk dixin. Li ser vê bingehê dema ku di poetîkaya helbestvanên modern da welat dibe cihekî pîroz û delala helbestê neqşebendî li ser nerîta helbesta sofîgerîyê berdewam welatên manewî dikin armanca helbesta xwe û pesnê lamekanîyê didin. Bi bawerîya me wek jîngeha şêxê neqşebendî sadetîya jîyana gundan jî hêz dide vê "lamekanî"yê û wan ji realîteya dinyayî qut dike.

Di poetîkaya Neqşebendîtîyê da cihekî navendî yê kesayetîyên karîzmatîk (şêx/murşîd) heye. Ev kesên ku dibin rêberên evîna Pêxember û Xwedayî tekane bikerên vê rêbazê ne. Li hember van kesayetîyên payebilind, rola murîdan gelek nizim e. Ji vî alîyî ve peywendîya şêx û murîdan herwek peywendîya şah û bendeyan asîmetrîk e. Seydayê Liceyî di medhîye û mersîyeyên xwe da bi çendîn metaforên edebî vê rewşê derdibire û vê dike navenda helbesta xwe û dema ku şêxên xwe dişibîne şah û dilberên rojhilatî xwe jî wek bende û evîndarekî dilşewat wêne dike.

Poetîkaya Neqşebendîtîyê ji ber ku xwe dispêre tevger û rêxistineke civakî herwek bizavên din ên civakî û sîyasî edebîyatê dike zemîneya bangeşeya tevgera xwe ya civakî. Ji ber vê di helbestên helbestvanên neqşebendî da em rastî bangeşe û pedagojîya Neqşebendîtîyê tên. Ji vî alîyî ve pesindana kesayetîya şêxan û wek rêçikên perwerdekirina rêwîyên vê rêbazê wênekirina destûrên wan ên suhbet, rabite, zikir û muraqebeyê taybetmendîyên dîyar ên poetîkaya Neqşebendîtîyê ne. Seydayê Liceyî jî bi têgihîştina xwe ya evîna muteal û bi dîyarkirina destûr, nasname û pedagojîya taybetî ya Neqşebendîtîyê dibe nûnerekî tîpîk ê vê xwendingehê û helbestên wî ji bo têgihîştina vê peotîkayê mînakên balkêş in.

## ÇAVKANÎ

Adak, A. (2017). Serdema xalidîtiyê di tarîxa edebiyata kurdî ya klasîk de. *Kürt Tarihi*. (30), 61-66.

Adak, A. (2019). *Teşeyên nezmê di edebîyata kurdî ya klasîk de*. Nûbihar.

Algar, H. (2007). *Nakşibendilik*. A. C. Köksal (Haz.). İnsan Yayınları.

Bağdâdî, M. H. (2000). *Risale-i hâlidiye mecd-i talid şem'üş şümus*. Sey-Tac.

Bedlîsî, Ş. (2007). *Şerefname* (Wer. Z. Avci). Avesta.

Bruinessen, M. (2003). *Ağa, şeyh, devlet* (Çev. B. Yalkut). İletişim.

Bruinessen, M. (2008). *Kürdistan üzerine yazılar* (Çev. N. Kıraç ve diğerleri). İletişim.

Doskî, T. Î. (2012). Pêşkêşî. *Dîwana hadî*. T. Î. Doskî (Amd.). Nûbihar.

Eraydın, S. (1994). *Tasavvuf ve tarikatlar*. Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Vakfı Yayınları.

Ergün, Z. (2022). *Ekoller ve kurumlar dil bilimleri*. Di nav M. N. Doru ve K. Gökdağ (Ed.). Hacî qadirê koyî: "mucedid"ê helbesta kurdî û "mehdî"yê modernîya kurdan, (rr. 169-189). Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Hezanî, Ş. E. (2016). *Dîwan*. M. B. Tarînî (Amd.). Lîs.

Işık, F. (2023). *Lice zirkileri aile tarihi*. Logo Yayınevi.

Kavak, A. (2009). *Dîvân-ı mevlânâ halidi bağdadi*. Ensar Yayıncılık.

Kavak, A. (2019). Mevlânâ halid el-bağdâdi'ye göre irşad ve mürşid-i kâmil. *Şırnak Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. *10* (22), 5-22.

Liceyî, M. M. (2012). *Dîwana hadî*. T. Î. Doskî (Amd.). Nûbihar.

Qewmanî, Ş. M. H. (2011). *Dîwan*. M. Seydağlu (Amd.). Nûbihar.

Tenik, A. (2015). *Tarihsel süreçte kürt coğrafyasında tasavvuf ve tarîkatlar*. Nûbihar.

Weismann, I. (2015). *Nakşibendilik* (Çev. İ. Kelkitli). Litera Yayıncılık.

Yaşar, M. A. (2012). *Dünden bugüne lice sempozyumu bildirileri*. İçinde A. Erkol ve A. Adak (Ed.). Osmanlı Hakimiyetinde Lice, (ss. 95-112). Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Yüksel, M. (1993). *Kürdistan'da değişim süreci*. Sor Yayıncılık.